

Ji bo dêûbavên, zarokên wan diçin kreşên Berlinê

22.01.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan li ser girtina hêlînan ya hete 14.02.2021an û her wisa li ser mafê lînêrîna acîl

Stî û mîrzayên rêzdar, dêûbavên hêja,

Ji ber zêdebûna bi berdewamî ya bûyerên enfeksiyonê û cûreya nû ya vîrusa koronayê Senatoya Berlinê di 20.01.2021an de biryar stand, ku hêlînên zarokan werin girtin. Sedemeke din a standina biryarên dorfirehtir jî ev e, ku her çiqas hêdî hêdî be jî dîsa her bêhtir mirov dixwest sûtê ji lînêrîna acîl a zarokan bigire û ji ber vê sedemê em nikaribûn di kêmkirina pandemiye de bigihijin armanca xwe.

Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan baş dizane, ku ev rêbazên nû bandorê li rewşa we ya şexsî dike. Ev çend meh in, ku hûn û zarokên xwe bi awayekî mecbûrî di nav astengiyên mezin de ne. Lê belê em dîsa ji we rica dikin – bi awayekî, ku rewşa awarte ya civaka giştî li ber çavan were girtin – bi qasî ku pêkan e, li malê li zarokên xwe binêrin. Bi vî awayî hûn dibin alîkar, ku pêwendiyên bi kesên re kêmkirina bibin û wisa belavbûna vîrusa koronayê paş bikeve.

Bi zelalî ev biryar ji aliyê Senatoya Berlinê ve hatine standin:

- Hêlînên zarokan ên danê rojê dê ji bo kêmkirina pandemiya koronayê, piştî **25.01.2021**an, di dema lockdownê de **girtî bin**.
- Ji vê demê û wir ve, tevahiya hêlînên zarokan dê di dema lockdownê de xizmeta **lînêrîna zarokan a acîl** bidin.
- Nabe ku barên hêlînên zarokan kêmezêde ji **50 %** zêdetir be.

Rêbazên ji bo sûdgirtina ji lênêrîna zarokan a acîl:

Mirov dikare sûtê ji lênêrîna zarokan a acîl bigire, gava

- **pêdiviyeye wan ya awarte û acîl ya ji bo lênêrîna zarokan hebe**

û di heman demê de

- **xebata dê yan jî bav (her wisa Homeoffice) di lîsteya xebatên bi sîstemê ve girêdayî (Lîsteya KRITIS) de be.**

Hûn dikarin lîsteya nû û sererastkirî li ser vê bibînin: <https://www.berlin.de/sen/bjf/corona/kita/>

Wekî din divê derfet hebe, ku zarokên dê-bavên tenê û zarokên bi astengî jî sûtê ji lênêrîna zarokan a acîl bigirin. Di vê rewşê de têr dike, ku pêdiviyeye awarte û acîl ya ji bo lênêrîna zarokan hebe.

Bi dûr û dirêjî:

Dibe ku ji ber xebatê yan jî sedemên şexsî pêdiviyeye awarte û acîl ya ji bo lênêrîna zarokan çêbe. Dibe ku ev pêdivî ji bo rojekê tenê be yan jî pêdiviyeye berdewamî yan jî bi rêk û pêk be.

Ji kerema xwe re bi saziya xwe re rasterat pêwendî deynin û binêrin, ka derfeta we heye, ku hûn, çend roj bin jî, li malê li zarokê xwe binêrin. Ji kerema xwe re bi alîkariya pêwendîya rasterast a bi saziya xwe re li çareseriyên bigerin, ku di mijara lênêrîna zarokan a acîl an jî sûdgirtina ji xizmetên hêlînê yê berbisînorkirî de armanca kêmkirina pêwendîyan li ber çavan digire.

Nabe ku saziya we li kêmezêde ji 50 % zarokan binêre. Di vê rewşê de, dibe ku bi qasî têr bike, xebatkarên amade tune bin. Saziya we ji bo ku bikaribe di vê rewşê de xizmeteke baş bide zarokên pêdiviyeye wan a awarte û acîl heye, dibe ku saziya we bi we re pêwendî deyne û li gel we li modelên alternatîv yê lênêrîna zarokan bigere, bo nîmûne ji bo çend roj û/yan jî hefteyan. Ji kerema xwe re di vê mijarê de li gorî hêza xwe piştgiriyê bidin hêlîna zarokên xwe û xweşbîn bin, gava ku di destpêka bicîanîna rêbazên nû de di 25.01.2021an de hin tişt hêj ne saz kirî bin.

Ji bo pirsên berfireh, ku hûn nikarin bi hêlîna xwe re çareser bikin, xeta telefona acîl a hêlînan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an heta 13an xwe bigihîninê.

Derfetên Heqdanê ji bo dêûbavên nikarin sûdê ji lênêrîna zarokan a acîl bigirin:

Gava hûn ji ber krîterên li jor hatine nivîsîn nikaribin sûdê ji lênêrîna zarokan a acîl bigirin, em dixwazin hûn li van rêzîknameyan binêrin:

1. Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê yê berfirehkirî li gorî qanûna § 45 bend 2a SGB V

Gava hûn ji ber krîterên li jor hatine nivîsîn nikaribin sûdê ji lênêrîna zarokan a acîl bigirin, li gorî rewşê mafê we heye, ku hûn Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê bigirin.

Ji 05.01.2021an ve ne tenê di rewşa nexweşiyê de hûn dikarin ji vê mafê xwe sûdê bigirin, lê her wisa, gava zarokê we ji ber pandemiye mecbûrî li malê bimîne û hûn hay jê bimînin. Ev rewş dibe ku bo nîmûne ji ber van sedeman hebe, gava

- hêlîna we girtî be,
- zarokê we divê bikeve karantînayê yan jî
- hûn ji ber pêşniyara daîreyeke dewletê li malê li zarokê xwe binêrin.

Bêhtirîn demdirêjiya mafgirtinê ji bo kesên bi sîgorteya qanûnî ji bo sala 2021an ji 10an derket 20 rojên xebatê ji bo her yeka/ê dê û bavî û ji bo dê yan jî bavê tenê li zarok dinêre ji 20an derket 40 rojan. Divê hûn ji bo pereyê zarokan ê nexweşiyê serlêdanê li şirketa sîgortaya xwe bikin. Li wê derê formên serlêdanê yê pêwîst dê radestî we werin kirin. Şirketa sîgortayê dibe ku ji bo vê yekê li gorî rewşê bawernameyeke ji hêlîna zarokê/a we bixwaze. Mînakeke ji bo vê yekê jî di nav vê nivîsê de ye.

Me ji ber vê sedemê ji hêlînên zarokan xwest, ku gava pêdivî hebe, ew vê bawernameyê bidin we.

2. Mafê tezmînatê li gorî qanûna § 56 bend 1a IfSG

Wekî din hûn dikarin di rewşên taybet de tezmînateke ji ber kêmbûna dahatûyê li gorî § 56 bend 1a ya Qanûna Parastina ji Enfeksiyonê (IfSG) bigirin. Şertê ji bo vê yekê bi taybet ev in, ku

- hêlînên zarokan ji aliyê daîreyên dewletê ve ji bo demekê werin girtin, ku pêşî li belavbûna enfeksiyon an jî nexweşiyên belavker were girtin an jî ji ber qanûna parastina ji enfeksiyonê lênêrîna zarokan qedexe be
- wekî din hîç derfeta we ya pêkan ji bo lênêrîna zarokê/a we tune be
- lênêrîna zarokan di dema girtina hêlînan de mecbûrî ji aliyê kesê dixebite ve pêk were û
- ji ber vê yekê dahatûya wî kêmbibe.

Hûn dikarin agahiyên berfirehtir yê di derbarê mafê tezmînatê li ser vê malperê bibînin :

<https://www.berlin.de/sen/finanzen/service/entschaedigung/schulschliessung/artikel.935438.php>

Mirov dikare tezmînata li gorî qanûna IfSG bi pereyê zarokan ê nexweşiyê re, ku li jor hatiye diyarkirin, di heman demê de bigire. Ji bo lênêrîna zarokan a ji ber girtina hêlînan a beriya 05.01.2021an pereyê zarokan ê nexweşiyê li gorî § 45 SGB V ne pêkan e, lê belê tezmînata li gorî § 56 bend 1a IfSG pêkan e.

Mesrefên xwarin û vexwarinê

Ji piraniya welatên federal cuda, li Welatê Berlinê di beşa hêlîna zarokan de hîç heq nayê standin. Divê hûn di rewşa asayî de li gorî § 3 bend 5 ya Qanûna Beşdariya li Lêçûnên Lênêrîna Zarokan a Danê Rojê (TKBG) parçeyek ji mesrefên xwarin û vexwarinê yên ji ber xizmeta lênêrîna zarokan a danê rojê pêk tên bidin, ku mehê bi qasî 23 Euro ye.

Heqê xwarin û vexwarinê piranî her wisa di dema rojên girtî yên bi rêkûpêkî yan jî di demên nexweşketina zarokî/ê de jî tê dayîn, ku di van rojan de sîd ji xizmeta lênêrîn û xwarin û vexwarinê nikaribe were girtin jî. Heman tişt di destpêkê de her wisa ji bo çarçoweya girtina saziyan ango xizmeta acîl jî derbas dibe. Tenê di rewşên taybet de, wekî girtina hêlînên zarokan a ji bo demeke dirêj, ev mecbûriyet dibe ku betal bibe. Lê belê di meha çileyê de rewşeke wisa tune ye.

Ji ber vê yekê divê hûn ji niha pê ve jî heqê mesrefên xwarin û vexwarina xwe bidin. Lê gava ji ber pêşketinên di demên pêş de guherîn di vê mijarê de çêbin, em ê di demeke nêz de yekser agahî bidin we.

Hûn dikarin vê agahiya ji bo dêûbavan, di demeke nêz de her wisa bi gelek zimanên din, li ser malpera Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan bibînin:

<https://www.berlin.de/sen/bjf/coronavirus/aktuelles/schrittweise-oeffnung-kita-undkindertagespflege/>

Di dawiya nivîsê de em spasiya we dikin, ku hûn piştgiriya didin û di vê rewşê de bi sebr in, ku bandoreke mezin li tevahiya mexdûran dike. Bimînin di xweşî û tenduristiya de!

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk